SÎNOR

MAÇEKA HESRET

Luqman Asîhî

Mizgîn ji me û wê de raketibû, du-sê dostên wê kulîlkên sor-zer kom kiribûn û ristik jê çêdikirin. Dukêleka spî ji koçkilê wan yê biçûk bilind dibû û fîş fîş ji qorî dihat. Di nav me de tenê wê her sal cejna bûna xwe dikir û me jî bi saya wê stiranên evîndaran digotin û caran tam dikire maçan. Hevalê min ê Azad li min zivirî û hêdî di guhê min de got: "Keko min wêneyek ji pelên gulan dirist kiriye ez ê îro bi diyarî bidime Mizgînê, ma ne baş e?"

Min got, pir baş e.

… A ez bidime hevala Mizgîn ji diyariyên we hemûyan hêjatire. Ev gotin min di hizra xwe de got û paşê min li hevalê Azad vegeran: Tenê em hingê dikarin defterên hevdû bixwînin, dema yek ji me dihê şehîdkirin… Wê rojê Hêrîş bi wê xwînê ve binax kirin. Defterka wî di xwînê de wer bibû, min ji kûrka wî anî der, paş çend rojekan min lê mêze kir,

li ser rûpelê dehê wiha nivîsîbû: *"niho demjimêr 7,30-ê rojê 20. 03 ye paş nîv demjimêrekî din em wê dest bi hêrîşa xwe bikin û mizgînîka porzera çavşîn 15 gavan ji min dûr e. Sozbe ger ez bi saxî vegeriyam û şehîd nebûm, ez maçekê li rûkê Mizgînê yê hinarî bidim û çi bibe bila bibe…"*

Min hê hemû ji Azad re bi dawî neanîbû Mizgînê got: "De hun jî werin îro li min pîroz bikin. Her yekê cejna wê lê pîroz kir û diyariyek dayê, min jî defterka Hêrişê şehîd da destan, wê jî havête di nav diyariyên din de û dengê firokeyekê hêdî hêdî çiya tejî dikir.